KNK Bulten

Bultena Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê * Hj.: 2 * Adar 2007

KNKyê seradanîya Kurdistana Federal kir

KNK ji ber hewcehîya yêkitîya neteweyî hatîye damezrandin. Mîsyonê KNKyê di çarçoveya herî fireh da pêkînana tifaqa navxweyî ye. KNK ne alternatîva yêk bi yêk organîzasyonên polîtîk yên Kurdistanê ye. KNK zemînê komerîya hemû element û dînamîkên neteweyî ye. KNK di wê şuûrê da ye ku îro ew yêkitîya ku têtе xwastin û xiyal kirin, pêknehatîye. Belêm KNK bi hêvî û bawer e ku ew yêkitî dê bête pêkînan. Ji ber ku şoreşa mezin ya Kurdistanê vê yêkê elzem dike. KNK ji bo vê armancê heye û li goreyî vî mîsyonê xwe di nav bizavê da ye. KNK di dereceya pêşîn da dixwaze di navbeyna hemû hêz û kesên neteweyî da têkilî û dîyalog hebe. KNK bêdîyalogîyê ji bo serkevtina şoreşa Kurdistanê, bo paşeroja xelkê Kurd û xelkên kêmanî yên Kurdistanê, ji kêmasîyê wêdatir, tehlîke dibîne. Em di wê bawerîyê da ne ku dîyaloga herî xirab, ji bê dîyalogîyê baştir e. KNKyê li ber vê destûrê, delegasyonek şande Kurdistana Federal ku zemînê têkilî û dîyaloga navxweyî pêkbîne û di mayîndekirina dîyalogê da gavên konkret biavêje. Delegasyona KNKyê di midehê sê heftîyan da, [Ji 23yê Çileyê heta 12yê Sibatê], ji organîzasyonên sosyopolîtîk, sosyokulturel, kesayetîyên serbixwe yên polîtîk û ronakbîr, nivîskar, hunermend heta serokatîya parlementê, parlementer, wezaret û wezîran û xelkê sade, hevdîtinên berfireh û berwer pêkînan. Delegasyona KNKyê pêşwazî û mêhvandarîyeke germ dît û helbet spasdar e. KNKyê bi seradanîya Kurdistana Federal dergehê dîyalogê vekirîtir kir û di pratîkê da jî gavên hêvîdar hatin avêtin. Têtе hêvî kirin ku avakirina rêya dîyaloga navxweyî bi gavên nûtir bête pêşxistin û saxlem kirin. Di vê prosesê da wezîfeya herî mezin, bi berpirsiyarî rabûne. Her alî û her kesên ku bi berpirsiyarîya şoreşa Kurdistanê û azadîya xelkê Kurd û xelkên Kurdistanê rabûyî, divêt bi vê berpirsiyarîyê hereket bikin. Li milekê ajîtasyona tifaqa navxweyî kirin, belêm li milê dî jî tovên nifaqa navxweyî çandin, paradokseke kûr e û xirabtirîn reftar e beramberî xelkê xwe. Li ser qedera şoreşa Kurdistanê, li ser bizava azadîya xelkê Kurd û xelkên dî yên Kurdistanê bi pozîtîvî çi têtе hizirîn [fikirîn], di pratîkê da jî divêt ew bête kirin. Anku fikir û zikirê azadîxwazan divêt wekhev be. Bi hêvîya ku dîyaloga navxweyî, ber bi pêkînana yêkitîyeke kamil ya neteweyî ve biçe. Çiku garantîya parastina hemû destkevt, çeper û bihayên neteweyî, yêkitîya neteweyî ye.

ROJAN HAZIM

”... dîyaloga herî xirab, ji bê dîyalogîyê baştir e...”

www.arsivakurd.org

Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê, digel Enstîtuya Kurdî ya Brukselê, li 12yê meja Çile, sempozyûmek amade kir. Sempozyûm bi program, mijar, beşdar û konklusyona li jêr, bi serkevtî xilas bû. Yêkitîya Ewrûpayê bersiva konklusyona sempozyûmê jî bi fermî da. Nameya YEyê jî li jêr e:

Programa sempozyûma li ser zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî bi vî rengî hate amade kirin:

Amadekar:
Enstîtuya Kurdî ya Brukselê & Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê

Mijar:
Di prosesa endametîya Yêkitîya Ewrûpayê [YE] da rewşa zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî li Tirkîyeyê û polîtîka dewletî ya Tirkîyeyê li ser vê pirsê û reftara YEyê.

- Cografyaya zimanê Kurdî û dereceya bi kar înana zimanê Kurdî li vê cografyayê. [Rojan Hazim]
- Bi giştî rewşa zimanê Kurdî û perwerdeyê li Tirkîyeyê. [Samî Tan]
- Bi giştî rewşa zimanê Kurdî û perwerdeyê li Ewrûpayê. [Derwêş Ferho & Fehmî Balayî & Xalidê Ezîz]
- Civatên pir zimanî û faydeyê pir zimanîyê û multîkulturelî. Zimanê serdest û zimanê bindest, asîmîlasyon û encamên wê û polîtîka asîmîlasyonîst ya dewleta Tirkîyeyê. [Hugo Van Rompaey]
- Di çarçoveya „huqûqa xelkan“ da, perwerdeya zimanê Kurdî û perwedeya bi zimanê Kurdî li Tirkîyeyê divêt çawan be? [Prof. Dr. Udo Steinbach]
- Li goreyî huqûqa Ewrûpayê û Krîterên Kopenhagê, perwerdeya Kurdî li Tirkîyeyê divêt çawan be? [Gerd Greune]
- Rola Yêkitîya Ewrûpayê ji bo perwerdeya zimanê Kurdî û perwedeya bi zimanê Kurdî li Tirkîyeyê. [Haydar Işik]

Demê sempozyûmê:
Roj: 12 Çile 2007, eynî [înî]
Seet: 10.00 – 17.00
Cih: Parlementa Belçîkê, Bruksel / Huis der Parlementairen, Rue Luvenseweg, 21 - 1000 Brussel-Bruxelles.

***

Konklusyona sempozyûmê

”Sempozyûma li ser zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî”, di roja 12yê meha çile ya sala 2007ê da, li Brukselê li avahîyê Parlementa Belçîkê pêkhat û ev konklusyon pêşkêşî YEyê û bîr û rehîya giştî kir.
Sempozyûm bi berfirehî li ser pirsa bi giştî rewşa zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî ya li nav tixûbên fermî yên Tirkîyeyê û Ewrûpayê rawesta. Ji axivtin, pêşkêşî û riberizên sempozyûmê derkete meydanê ku zimanê Kurdî hem di warê axivtinê da, hem jî di warê nivîsîn û perwerdeyê da li Tirkîyeyê di dereceya man û nemanê da ye. Ev rewşa trajîk jî bi timamî ji ber polîtîkên asîmîlasyona sîstematîk ya dewleta Tirkîyeyê pêkhatîye. Beşdarên sempozyûmê bi vekirî destnîşan kirin ku heke dewleta Tirkîyeyê, di van polîtîkên xwe yên asîmîlasyonîst da israr bike, dê adeta jenosîdeke zimanî derkeve meydanê. Sempozyûmîstan di danezanên xwe da gotin ku zimanek heke di nav sîstemê perwerdeya dewletî da neyête bi kar înan, ew ziman pêşnakeve û ber bi mirinê ve diçe. Lewma gelek bi giringî li ser perwerdeya bi zimanê Kurdî hate rawestan û bangî dewleta Tirkîyeyê hate kirin ku rojek zûtir sîstemê perwerdeya xwe ya dewletî li goreyî xwastekên xelkê Kurd ji nû ve plan bike û ji dibistana seretayî heta unîversîteyê Kurdî li tenişta Tirkî, fermîyen bête bi kar înan.
Sempozyûm herweha li ser rewşa negatîv ya perwerdeya Kurdî li welatên Ewrûpayê jî rawesta û bangî YEyê kir ku daxwaza Kurdên li nav cografyaya YEyê jî bîne cih û perwerdeya zimanê Kurdî di dibistanên dewletê da bide kirin.
Sempozyûmê herweha bangî Yêkitîya Ewrûpayê jî kir ku pirsa perwerdeya bi zimanê Kurdî sist negire û bi micidahî li ser raweste û fişarê ji ser serê dewleta Tirkîyeyê sist neke.

www.arsivakurd.org

YEyê hewce ye bi Tirkîyeyê bide zanîn ku yêk ji esasên ”Krîterên Kopenhagê” jî ew e ku her xelk bi zimanê xwe bête perwerde kirin û ev erk jî yê dewletê ye.
Di sempozyûmê da herweha hate gotin ku makqanûna Tirkîyeyê astenga herî mazin e û divêt bête guhorîn. Bi taybetî du maddeyên makqanûnê hatin destnîşan kirin ku lezînen divêt bêne rakirin. Maddeyê 3yê û maddeyê 42yê astengên herî mezin in li pêşîya perwerdeya bi zimanê Kurdî. Bang li YEyê hate kirin ku di vî warî da aktîv be û van maddeyên makqanûnê behemehal bide rakirin û binaxeya qanûnî ya perwerdeya bi zimanê Kurdî bi Tirkîyeyê bide amade kirin.

Ji Komisyona YEyê ev daxwaza kurt û konkret hate kirin:
Perwerdeya bi zimanê Kurdî divêt li tenişta zimanê Tirkî, di nav sîstemê perwerdeya dewletê da fermîyen bête dan. Ji ber hindê, tika ye, pirsa ”Perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî” danin serê rojeva gotûbêjên xwe yên digel dewleta Tirkîyeyê. Du maddeyên asteng yên makqanûna Tirkîyeyê, md. 3 û md. 42, ji makqanûnê bidine rakirin.

12yê Çileya 2007ê, Bruksel

Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK]
Enstîtuya Kurdî ya Brukselê

Beşdarên sempozyûmê jî ev bûn:
Prof. Dr. Udo Steinbach, Deutsches Orient-Institut, ji Elmanya
Gerd Greune, **serokê Institute for International Assistance and Solidarity,** ji Elmanya & Belçîk
Hugo Van Rompaey, Senatorê berê, ji Belçîk
Derwêş Ferho, nivîskar, serokê Enstîtuya Kurdî ya Brukselê
Rojan Hazim, nivîskar, serokê Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê
Haydar Işik, nivîskar, endamê Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê
Samî Tan, nivîskar, serokê Enstîtuya Kurdî ya Stanbolê
Fehmî Balayî, ressam, serokê Enstîtuya Kurdî ya Berlînê
Xalidê Ezîz, nivîskar, nimayendeyê Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê

Têbînî: Ji beşdarên sempozyûmê, Prof. Dr. Udo Steinbach û Samî Tan, nikarîn beşdarî sempozyûmê bibin û tikaya lêborînê kirin.

Konklusyona sempozyumê, bi nameyekê ve bo YEyê hate şandin. Name û bersiva wan li jêr e:

Bo Olli Rehn
Komîserê karûbarê firehbûna Yêkitîya Ewrûpayê

19 Çile 2007, Bruksel

Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê û Enstîtuya Kurdî ya Brukselê bi hev ra di 12 Çirî 2007ê da li Brukselê li avahîyê Parlementa Belçîkê, ”Sempozyûma li ser zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî” pêkînan.

Mijara sempozyûmê; ”Di prosesa endametîya Yêkitîya Ewrûpayê [YE] da rewşa zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî li Tirkîyeyê û polîtîka dewletî ya Tirkîyeyê li ser vê pirsê û reftara YEyê” bû.

Piştî sempozyûm xilas bûyî ji teref amadaker û beşdaran ve konklusyonek jî hate belav kirin. Di konklusyonê da jêdera sempozyûmê bi zelalî û konkretî hatîye kivş kirin. Me hewce dît ku vê konklusyonê digel we parve bikin û herweha hêvî û daxwaz jî dikin ku hûn pêşnîyar û xwastekên têda hatine formûle kirin li ber çavan bigirin.

Tikaya me ew e ku hûn li ser vê xawsteka demokratîk ya xelkê Kurd, li ser pirsa perwerdeya bi zimanê Kurdî, bi micidahî rawestin û di vî warî da gavên pozîtîv bi dewleta Tirkîyeyê bidine avêtin.

Konklusyona sempozyûmê di pêvekê da bo we dişînin.

Digel rêz û silavên me.

ROJAN HAZIM
Nivîskar
Serokê Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê

www.arsivakurd.org

Wergêra bersiva YEyê ya ji Inglizî li jêr e.

Ji Komisyona Ewrûpayê
Dîrektorata Giştî ya Firehbûnê

Bo Birêz Rojan HAZIM
Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê
Jean Stasstraat 41
1060 Bruksel

Bruksel, 02 Sibat 2007
ELARG CD reg D(2007)100482

Birêz Hazim,

Bi daxwaza Mr. Rehn ez bersiva nameya we ya 19yê Çile 2007 ya li ser Sempozyuma zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî didim.

Pirsgirêkên ku we fokus înaye ser gelek giring in. Di raporên xwe û di gotûbêjên me yên digel dewleta Tirkîyeyê da em jî li ser sekinîn. Di rapora pêşveçûnê da ya Komisyonê li 2006ê me nivîsî ku zarokên li Tirkîyeyê ku makzimanê wan ne Tirkî ye, nikarin bi makzimanê xwe perwerdeyê wergirin di nav sîstemê perwerdeyê yê fermî yê dewleta Tirk da. Herweha me nivîsî ku perwerdeyeke wisa tinê di nav çarçoveya mektebên prîvat da heye. Lê belê hemû kursên li ser zimanê Kurdî li 2004ê hatin girtin. Lewma vê gavê çu îmkanê Kurdî fêrbûnê di sîstemê perwerdeya fermî anjî ya privat da nîne.

Em van mewzûyan digel dewleta Tirk riberiz dikin, daku Kurd bigihine îmkanên wekhev yên fêrbûna zimanê xwe û perwerdeya bi zimanê xwe.

Digel silavan,

Christian Danielsson,
Serokê Unitê

***

”.. Pirsgirêkên ku we fokus înaye ser gelek giring in. Di raporên xwe û di gotûbêjên me yên digel dewleta Tirkîyeyê da em jî li ser sekinîn...”

Konseya Rêvebir ya KNKyê kombûna xwe ya pêşîyê ya sala nû, di 13yê meha Çile da kir.

Konseya Rêvebir ya KNKyê di destpêkê da, sala nû, sala 2007ê, li neteweyê Kurd û hemû xelkên Kurdistanê pîroz kir û hêvî û daxwaza jîyaneke bextewar, dilşa û aştîyane ji bo xelkê Kurd û xelkên dî yên Kurdistanê û bo hemû xelkên cîhanê kir.

Konseya Rêvebir ya KNKyê, li ser bûyer û qewimînên sala borî, sala 2006ê, rawesta û gihişte wê qenaetê ku xelke Kurd li çaralî welat û derveyî welat, di hemû cepheyan da, digel kêm û kasîyan jî be, gavên serkevtî avêtine û destkevtên xwe jî parastine. Konseyê herweha destnîşan kir ku tekoşîna xelkê Kurd ji bo sala nû, sala 2007 jî zemînekî saxlem pêkînaye.

Konseyê pêşhatinên ji sala borî dewrî sala nû bûyî jî wisa biha kirin:
Bizava neteweyî ya xelke Kurd bi giştî, hêza herî organîze, dînamîk û demokratîk ya rojhilatanavîn e. Bi taybetî ji pêşhatinên Iraqa nû û reftara Îran, Sûrîye û Tirkîyeyê, bi zelalî kivş bûye ku, armanca demokratîzasyona rojhilatanavîn bêyî hêza xelkê Kurd nemumkun e. Di pêşxistina prosesa demokratîzasyona rojhilatanavîn da, kilîlê stabilîyet û tenahîya navçeyê di destê xelkê Kurd da ye. Di serî da Amerîka, Yêkitîya Ewrûpayê û bi giştî cîhana humanîter û demokratîk, pêdivî ye ku vê rastîyê bibînin û li goreyî vê potansîyela xelkê Kurd pozisyona xwe kivş bikin.
Di serî da Tirkîye û welatên cîran yên statukoperês, Iran û Sûrîye, adeta qedera xwe bi hev ve girêdane û beramberî cepheyê demokrasîye, ku hêza herî bi seng ya vî cepheyî hêza neteweyî ya xelkê Kurd e, cepheyê dijî demokrasîyê raçandine û vê rola xwe ya bêyûm didomînin. Di nav vê rikeberîyê da, dînamîkên neteweyî yên xelkê Kurd, li hemû parçeyan û meydanên dîasporayê organîzebûneke ku dil dixwaze hêj bi timamî pêkneînane. Zeafa di vî warî da ya ji sala borî mayî, divêt di vê sala nû da bête rakirin û rojek zûtir tifaqeke xurt û fireh di navbeyna hemû hêzên neteweyî da bête pekînan. KNKyê di sala borî da hewildanên xwe yên ji bo armanca tifaqa neteweyî domandin û dê vê rola xwe di sala nû da jî bidomîne. Mîsyonê sereke yê

www.arsivakurd.org

KNKyê pêkînana tifaqa herî fireh ya neteweyî ye. Ji bo vê armancê û li goreyî biryara kombûna giştî ya li gulana sala borî, dê ji bo komkirina konferanseke neteweyî xebata xwe xurttir bike.
Konseya Rêvebir ya KNKyê bi giringî li ser leyiz û entrîkayên Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê yên di derbareyê pirsa Kerkûkê da jî rawesta û reftara van dewleta şermizar kir û dubare destnîşanî bi yêkgirtina hêzên neteweyî kir ku spesîfîken li ser pirsa Kerkûkê bête rawestan û ji bo serkevtina referandûma îsal xebateke hevrayî bête kirin.
Konsey herweha li ser kar û bizavên ji bo aştîya di navbeyna dewleta dagîrker ya Tirkîyeyê û xelkê Kurd da jî rawesta û destek da xebata aştîyê ya ronakbîrên Kurd, Tirk û kêmanîyên dî yên li Tirkîyeyê.
Konseyê bangî YEyê jî kir ku di têkilî û gotûbêjên digel Tirkîyeyê da pirsa xelkê Kurd bi vekirî biaxive û terefê Kurd jî tevî van gotûbêjan bike.
Konseyê biryar da ku ji bo pîrozkirina Cejna Zimanê Kurdî li 14yê Gulanê hazirîyên rêkûpêk ji nihe ve bêne kirin û ev cejn bi coş û heyecaneke mezin ya neteweyî bête pîroz kirin.
Konseyê di encam da biryara destekkirina hemû xebat û têkoşînên hêzên neteweyî li çaralî welat û dîasporayê jî da û bang li hemû hêzên neteweyî jî kir ku dîyaloga di navbeyna xwe da jînde bikin û sala 2007ê bikin sala serkevtina xelkê Kurd.

Konseya Rêvebir ya KNKyê
13 Çile 2007, Bruksel

***

"... Di pêşxistina prosesa demokratîzasyona rojhilatanavîn da, kilîlê stabilîyet û tenahîya navçeyê di destê xelkê Kurd da ye. Di serî da Amerîka, Yêkitîya Ewrûpayê û bi giştî cîhana humanîter û demokratîk, pêdivî ye ku vê rastîyê bibînin û li goreyî vê potansîyela xelkê Kurd pozisyona xwe kivş bikin..."

Konseya Rêvebir ya KNKyê, li ser Yêkitîya Neteweyî programeke kurt û konkret pêşkêşî dînamîkên neteweyî kir. Wê programê li jêr didin:

Projeya KNKyê ya Yêkitîya Neteweyî

Ji kesan heta organîzasyonan, hemû Kurd, di axivtinê da mirîyên "Yêkitîya Neteweyî" ne. Çu gotin û axivtinên wan bêyî "Yêkitîya Neteweyî" naborin. Bêyî îstîsna di programên hemû rêxistinên sosyopolîtîk û sosyokulturel da, paragrafa herî balkêş ya li ser „Yêkitîya Neteweyî" ye. Belêm gava dor hate pratîkê, hûn dê bêjin ew kes û hêzên ji „Yêkitîya Neteweyî" behs kirî, ne Kurd in, ji neteweyekî dî ne!. Di pirsa „Yêkitîya Neteweyî" da Kurd hind paradoksal dijîn ku ecêbîyeke mezin e!. Teorîken cuda diaxivin, pratîken cuda dikin. Mixabin, yêk ji xasyetên herî negatîv ya bi giştî polîtîker û organîzasyonên sosyopolîtîk û sosyokulturel yên Kurda ev e. Lewma jî, di pratîkê da „yêkitî"yeke kamil danin alîyekê, „yêkitî"yeke relatîven maqûl jî pêknaêt. Ji ber vê encama ne bi dil, pirsa „yêkitî"yê çu cara ji rojeva Kurda jî dernakeve, belêm cihê xwe yê layiq jî wernagire.
Di vî warî da gava herî konkret Gulana 1999ê bi damezrandina KNKyê hate avêtin. KNK di dem û şertên hind gihiştî da hate ava kirin ku terkîba wê di destpêkê da firehîyeke maqûl nîşan dida. Lê belê, wekî hercar dawîya wê gavê nehate înan û piştî pênc salan zemînê fireh yê KNKyê dîsa ve hate teng kirin. Lê çiku KNK ji hewcehîya yêkitîya neteweyî derketibû, bi ketina nav şertên negatîv jî dawî lê jîyana wê nehat. Piştî kar û xebateke aktîv, bi armanca jîndekirin û reorganîzasyona KNKyê, kombûna giştî hate organîze kirin û di 13-14yê Gulana 2006ê da hate pêkînan. Di vê kombûna giştî

www.arsivakurd.org

ya reorganîzasyonê da, program û destûr ji nû ve hatin amade kirin û guhorînên pêdivî lê hatin kirin. KNK bi kombûna xwe ya Gulana 2006ê ve, xwe reorganîze kir, bi çavekî rexnegirî demê borî analîz kir, ji tecrubeya berê encamên pozîtîv derêxistin û li goreyî dem û şertên nû, planên nû amade kirin û bi projeyên nû armanca xwe zelaltir kir.

Li goreyî vê yêkê; KNK ne „partî“ ye û lewma jî xwe hevrikê çu partî anjî rêxistinên polîtîk nabîne. KNK organîzasyoneke sihwaneyî ya demokratîk û neteweyî ye. KNK ji baskê çepê heta rastê li ber hemû îdeolojî û dîtinên cuda, wekhev radiweste. KNK çi mînîmal, çi maksîmal bin, xwudanîyê li hemû proje, program û pêşnîyarên ji bo çareserîya pirsa Kurdistanê têne pêşkêş kirin, dike. Ji pêşnîyara herî mînîmal ya otonomîya kulturî ya demokratîk heta programa maksîmal ya serxwebûnê, KNK hemû teklîfan meşrû qebûl dike û piştevanîya van hemû programan dike. KNK bi vê pozisyon û reftara xwe ya neteweyî û demokratîk, zemînê hemû dîtin û pêşnîyarên cuda yên li ser pirsa Kurd û Kurdistanê ye.

Armanca sereke ya KNKyê, anku pêkînana tifaqa herî fireh ya hêz û kesên neteweyî, giringî û pêdivîya xwe di demê nû da jî, di dereceya herî bilind da diparêze. KNKyê di vî demê xwe yê nû da, di demê reorganîzebûnê da, ji bo karûbar û armancên xwe yên pratîk, dînamîzmeke berbiçav nîşan da. Îro KNK bi vê gava xwe ya nû ve, herwekî berê bi mîsyonê xwe yê komkerîya potansîyela neteweyî ve hereket dike. Bi vê armancê projeyeke pêkînana enîya herî fireh ya dînamîkên neteweyî amade kirîye. KNK hêvî dike ku, biçûk mezin hemû hêzên neteweyî û kesên di nav bizava neteweyî da cihê xwe girtî, di platformeke neteweyî da bêne nik hev û hêz û şiyana xwe bi hev ra ji bo armancên neteweyî seferber bikin û hêza neteweyî ya yêkgirtî derêxin pêşîya dewletên dagîrker yên Kurdistanê.

KNKyê ji bo vê armancê, programeke kurt û konkret ya deh maddeyî amade kirîye ku hemû dînamîkên neteweyî li ser gotûbêjê bikin û bigihin encameke bixêr ya neteweyê Kurd û xelkên dî yên Kurdistanê.

1. Kurdistan, di serî da xelkê Kurd û kêmanîyên dî, welatê hemûyan e. Kurdistan bi sê parçeyên xwe yên dagîrkirî ve, –parçeyê çarê anku başûr hate azad kirin-, kolonîya navneteweyî ye û xelkên Kurdistanê dijî kolonyalîstan têkoşîneke heq û rewa didin.
2. Civata Kurdistanê hem ji alîyê etnîkî ve, hem jî ji alîyê dînî û sosyolojîk ve, ne homojen e, heterojen e û divêt li goreyî vê rastîya civatê organîzebûneke xurt bête kirin.
3. Armanca hevpar ya hemû xelkên Kurdistanê rizgarkirina welat û azadkirina civatê ye. Parçeyê başûr yê Kurdistanê, bi têkoşîna xelkê Kurd û tifaqdarên xelkê Kurd îro hatîye rizgar kirin û xelkên têda hatine azad kirin. Parçeyên hêj di bin dagîrîyê da, piştevanîya herî mezin nîşanî vî parçeyê azad didin û ji bo parastina vî parçeyî çi hewce ye dê bikin. Rêvebirîya parçeyê azad jî dê ji bo pêkînana tifaqa neteweyî hemû hêz, şiyan û îmkanên xwe seferber bike.
4. Di serî da xelkê Kurd û hemû xelkên kêmanî yên Kurdistanê, statû bi çi rengî dibe ferq nake, ji bo Kurdistaneke demokratîk, sosyal, laîk-sekûlar, modern û pêşkevtî bi hev ra têkoşînê didin.
5. Kurd û xelkên dî yên kêmanî û rêber û rêvebir û organîzasyonên wan, ji bo demokrasîya herî fireh ya navxweyî xebatê dikin, têkoşînê didin û di pratîkê da jî bi cih tînin.
6. Kurd, kêmanîyên li Kurdistanê û pêkve pêşengên wan, di nav xwe û navbeyna xwe da rê û metodên dîyalogê di dereceya herî bilind da ava dikin û hemû pirs û pirsgirêkên di nav xwe û navbeyna xwe da rûdidin, bi rê û metodên aştîyane û demokratîk çareser dikin.
7. Kesayet, biçûk mezin hemû organîzasyonên sosyopolîtîk, sosyokulturel û sosyoekonomîk, bi tevahî pêşengên ronakbîrî, polîtîk û sivîl û demokratîk yên xelkê Kurd û kêmanîyan, li ser zemînê koalîsyoneke demokratîk û bi normên demokrasîya temsîlî, yêkitîyekê pêktînin û rêvebirîyeke neteweyî ya demokratîk hildibijêrin û bi rengê kolektîv û berdevkîya rotasyona demokratîk kar û xebata xwe di rê dibin.
8. Pêşengên xelkê Kurd û kêmanîyên li Kurdistanê, ji bo stabîlîyeta kar û xebatên hevrayî, mekanîzmayeke demokratîk ya fonksîyonel û efektîv ava dikin û di pratîkê da bi kar tînin.
9. Piştî avakirina yêkitîya neteweyî, ji bo çavdêrîkirina karûbarên hevrayî û kontrolkirina rûdanên negatîv û çareserkirina pirsgirêkên navxweyî, şûraya nobedarîya neteweyî bête hilbijartin û serdestîya wê ji teref hemûyan ve bête qebûl kirin.
10. Pêşengên bizava azadîya xelkê Kurd û xelkên dî yên Kurdistanê, ji bo gihiştina armanca

www.arsivakurd.org

xelkê Kurd û kêmanîyên li Kurdistanê, tifaqa herî fireh digel kes, hêz û dewletên demokratîk û humanîter pêktînin û desteka ji wan alîyan ve tête dan qebûl dikin.

KNK di wê bawerîyê da ye ku, ji bo avakirina yêkitîyeke neteweyî, dem û şert gelek gihiştîne û çu mazeretên maqûl nabîne ku hêz û kesên neteweyî bi vî erkê neteweyî ve ranebin. KNK zemînê xwe ji bo pêkhatineke bi vî rengî gelek di rê da dibîne û koşa xwe ji bo hemû dînamîkên neteweyî vedike. Belêm KNK herwisa hazir e ku ji bo pêkînana yêkitîya neteweyî fedakarîyê di maksîmûm dereceyê da jî bike. KNK çu asteng û giriftarîyên îdeolojîk, dogmatîk û tabûîst nasnake di pêşîya pêkînana yêkitîya neteweyî da. Lewma KNK di serî da ji navê xwe heta program û destûra xwe, amade ye ku ji nû ve veke ber riberiza herî tîr ku xizmeta yêkitîya neteweyî bike.

KNK ji bo vê armanca pêkînana yêkitîya neteweyî, planekî pratîk yê bi vî rengî pêşnîyar dike:

- Di destpêkê da têkilî û dîyalog
- Tesbîtkirina gav û hewcehîya lezîn ya xelkên Kurdistanê
- Gotûbêj û riberizeke têrker li ser hewcehî û komkirina konferanseke neteweyî
- Avakirina komisyoneke hevrayî ji bo raçandina rêya ber bi yêkitîya neteweyî ve
- Di vê prosesa avakirina yêkitîya neteweyî da, ji axivtinê heta nivîsînê, zimanekî çêker bête bi kar înan û medyaya neteweyî jî bi roleke pozîtîv xizmeta vê yêkê bike.

KNK bi bîr û bawerîyeke neteweyî, vê dîtina xwe pêşkêşî bîr û rehîya giştî ya neteweyî ya Kurdistanê dike û hêvî dike ku zûtirîn dem encameke di xêra xelkên Kurdistanê da bête bi dest ve înan û bigihin encameke pozîtîv û xwasteka xelkên Kurdistanê bînin cih û beramberî cepheyê bêyûm yê dijmin û dagîrkeran, birc û kela herî saxlem ya hemû xelkên Kurdistanê, ku ew jî tifaqa neteweyî ye, ava bikin.

Serkevtin ya Yêkitîya Neteweyî ya Kurdistanê ye.

Konseya Rêvebir ya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, KNKyê.

13 Çile 2007

***

”Serkevtin ya Yêkitîya Neteweyî ya Kurdistanê ye.”

Rêxistinên girêdayî sîstemê KKKyê, herweha endamên KNKyê jî ne, lewma delegasyona KNKyê gava çûye Kurdistana Federal, di keysekê da digel berpirsiyarên Konseya Rêvebir ya KKKyê jî li ”Warên Parastinê yên Medyayê”, bi kurtî li ser van xalên li jêr, ku di 13yê meha Çileya 2007ê da ji teref Konseya Rêvebir ya KNKyê ve hatibûn tesbît kirin, gotûbêjeke berwer pêkîna û di encam da lihevhatineke maqûl û têrker pêkhat.

- KNK wekî rêxistineke sihwaneyî ya neteweyî û demokratîk, di karûbarên xwe da otonom be.
- Butçeya xweser û sekretarîyek hebe.
- Ji alîyê kar û xebatê ve qabilîyeta manewrayê ya KNKyê bête xurt kirin.
- Di tesbîtkirina polîtîka neteweyî da digel KNKyê şêwir bête kirin.
- Strûktûra KNKyê ji nû ve bête ava kirin.
- Reformasyoneke polîtîk, îdarî û rêvebirî di KNKyê da bête kirin.
- Di rêvebirîya KNKyê da, mekanîzmayeke kolektîv û demokratîk ya berdevkîya rotasyonel bête danan.
- Ji bo kar û xebatên KNKyê medyaya neteweyî îmkanan zêdetir bide.
- KNK di karên bi giştî neteweyî û navneteweyî da, layiqen bête fonksîyonel kirin.
- KNK ji alîyê polîtîk û rêxistinî ve di dereceya herî bilind da bête destek kirin.

***

“... KNK çu asteng û giriftarîyên îdeolojîk, dogmatîk û tabûîst nasnake di pêşîya pêkînana yêkitîya neteweyî da...”

www.arsivakurd.org

Konseya Rêvebir ya KNKyê, di çarçoveya seradanîya xwe ya Kurdistana Federal da, bo partî û rêxistinên di desthilat û opozisyonê da cih girtî û serokatîya Parlementa Kurdistana Federal nameyek şand. Nimûneya nameyê jî li jêr didin:

03 Çile 2007, Bruksel

Bo
Partî û rêxistinên Kurdistana Federal
Serokatîya Parlementa Kurdistana Federal

Birayên hêja,

Di serî da em wekî Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK], sala we ya nû pîroz dikin û hêvî dikin ku sala nû, sala 2007ê, ji bo we, bo xelkê me xêr û xweşîyê bîne û bibe sala serkevtinên mezintir.

Di destpêka vê sala nû da, rewşa xelkê me ya li çaralîyê welat û derveyî welat ji alîyê we ve baş tête zanîn. Belêm, bi kurtebirî jî be, em jî dixwazin destnîşanîya çend pirs û pirsgirêkên li pêşîya bi giştî bizava neteweyî ya xelkê Kurd bikin. Cihê şahîyê ye ku parçeyê welatê me yê başûr, herçend di nav tixûbên Iraqa Federal da jî be, îro rizgarkirîye û xelkê me azadane jîyana xwe di rê dibe. Parlementa Kurdistanê, Serokatîya Kurdistana Federal, Hukûmeta Kurdistanê bi navê xelkê me li parçeyê başûr erkên xwe yên rêvebirîyê bi cih tînin. Ev hebûna îro, di serê vê sedsala nû da, sedsala 21an da, serkevtina herî mezin ya xelkê me ye û em hemû Kurd li çaralî welat û derveyî welat, pê serbilind in û parastina vê hebûnê yêk ji erkên xwe yên sereke dizanin.
Rejimên kolonyalîst yên li dormandorê welatê me, bi vê hebûna Kurdistana Federal hindî hûn bêjin aciz in û bi hemû hêz û îmkanên xwe ve lê digerin ku vê destkevta xelkê me têkbibin. Dijminên xelkê me, di serî da dewleta Tirkîye û Îran, Sûrîye û destikên wan, di her keysî da dixwazin hem ji çeperên xwe ve şerê xelkê me bikin, hem jî bi provakasyon û têkvedanên li nav welatî, rê li ber pêşveçûna xelkê me ya ji bo azadîyê bigirin. Terefên vê alyansa bêyûm ya bi pêşengî û organîzasyona dewleta Tirkîyeyê pêkhatî, gelek aşkera dixwazin bêhnê li xelkê me çik bikin. Rejimên Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê, hem yêk bi yêk li parçeyên di bin dagîrîya wan da şerê xelkê me dikin, hem jî bi hev ra dijî destkevta başûra Kurdistanê şerekî fetisandinê didomînin.
Li milê dî, herçend îro li parçeyê azadkirî yê başûr, di bin banê Parlementa Kurdistanê da temsîleke yêkgirtî ya neteweyî pêkhatibe jî, lê li parçeyên dî yêk bi yêk û di seranserê Kurdistanê da, hêj yêkgirtineke neteweyî ya kamil pêknehatîye. Eve cihê mixabinîyê ye û ji alîyê neteweyê Kurd ve zeafek e û dijminên xelkê me jî ji vê berbelavîyê istifade dikin. Hal ew e ku garantîya herî mezin ya parastina hemû destkevtên xelkê me, di serî da bi hêza xelkê me bi xwe pêktêt. Ji ber vê yêkê, em di wê bawerîyê da ne ku, beramberî tifaqa bêyûm ya dijminên xelkê me, divêt tifaqa herî mezin ya neteweyî ya xelkê Kurd bête pêkînan. Helbet em rasyonel dihizirin û ji tecrubeyên jîyana polîtîk ya xelkê xwe dizanin ku eve di rojekê da pêknayêt, lê ji bo vê armanca pîroz jî divêt hewildan hebin. Lewma em dixwazin bi armanca gotûbêjkirina pirsa yêkitîya navxweyî û hemû pirs û pirsgirêkên xelk û welatê xwe, digel we hevdîtineke birayane pêkbînin û ji bo yêkitîya neteweyî encamên bi xêr û bêr derêxin meydanê ku di pratîkê da bêne bi cih înan.

Me nîyet e wekî delegasyoneke KNKyê, di navbeyna rojên 20 û 31ê vê mehê da li welat seradanîya we bikin. Em hêvî û bawer dikin ku hûn dê demekê ji bo vê hevdîtinê vebirin.

Digel rêz û silavên me yên herî germ û birayane.

Bi navê Konseya Rêvebir ya KNKyê,
Serokê KNKyê
Alî Yigit [Eli Egîd]

***

"... Rejimên kolonyalîst yên li dormandorê welatê me, bi vê hebûna Kurdistana Federal hindî hûn bêjin aciz in û bi hemû hêz û îmkanên xwe ve lê digerin ku vê destkevta xelkê me têkbibin..."

www.ersivekurd.org

Delegasyona KNKyê seradanîya Kurdistana Federal kir.
Armanc û encama vê seradanîyê jî bi kurtebirî li jêr tête dan:

Delegasyona Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK], di navbeyna 23yê Çileyê û 12yê Sibatê da seradanîya Kurdistana Federal kir û bi partîyên desthilatê û opozisyonê, parlemento, parlementer û wezîran, rêxistinên nivîskar û ronakbîran û kesayetîyên polîtîk û ronakbîr yên serbixwe û dezgehên medyayê ra rûnişt û gotûbêjên berfireh yên li ser rewşa welat, navçe û cîhanê kirin. [Seradanîya biryargeha KKK, PJAK û merkeza PDK-Iran ya di serokatîya Ebdullah Hesenzade da jî hate kirin.] Delegasyonê herweha seradanîya "Kampa Mexmûr" [Mexmûra bakur], gora Mustefa Barzanî li Barzan, şehîdgehên "Karasungur" û "Harûn" li "Warên Parastinê yên Medyayê" û şehîdgeha Helepçeyê jî kir. (*) Delegasyona KNKyê ji serokê KNKyê Elî Egîd, cihgirê serok Tahir Kemalîzade, endamê konseya rêvebir ya KNKyê Rojan Hazim û endamê konseya rêvebir ya KNKyê Adem Uzun pêkdihat.

Armanca delegasyona KNKyê bi konkretî sê xal bûn:

1. Di navbeyna hêz û kesayetîyên polîtîk û ronakbîr yên Kurd da germkirina têkilîyan û avakirina dîyalogeke xurt û mayînde
2. Komkirina Konferansa Neteweyî
3. Vekirina Bûroya KNKyê li başûra Kurdistanê

Encama gera başûr

Delegasyona KNKyê di hemû hevdîtinên xwe da bi giringî li ser hewcehîya têkilîya germ û mayînde ya navxweyî rawesta û bal kêşa ser wê yêkê ku di navbeyna kes û hêzên Kurd da yêkser danûstandin hebin ku pirs û pisrgirêkên xwe di nav xwe da gotûbêj bikin û bi hev ra çareserîyan bibînin. KNK bi taybetî li ser rewşa nû ya başûr û êriş û fişar û provakasyonên Tirkîyeyê yên piralî jî sekinî û pêşniyarî hemû terefan kir ku di konferanseke neteweyî da kom bin û çi pirsên navxweyî hebin di konferansê da biaxivin û reftareke yêkgirtî ya neteweyî nîşanî yar û neyaran bidin. KNKyê ji terefan xwast ku heke ji ber rewş û konjonktûra bi taybetî başûr, direkt partî têda beşdar nebin jî, dikarin di sewîyeya ronakbîrî û temsîlkarîya îndîrekt da bêne bal hev. Pêşnîyara KNKyê ji alîyê prensîbî ve ji teref hemûyan ve maqûl hate dîtin, belêm bi taybetî partîyên li desthilatê di vê rewşa nazik da û ji ber fişarên dewleta Tirk xwe amade nedîtin ji bo konferansê û ev yêke jî aşkera gotin. Lê belê, tiştekî hevpar derkete meydanê ku hemû terefan dijî êrişkarîya aktîv ya dewleta Tirk nerazîbûna xwe nîşan dan û aşkera gotin ku heke Tirkîye muhtemelen dagîrkerîyê bike li başûr, dê bi hemû hêz û şiyanê ve dij rawestin û mil bi mile hev şerê Tirka bikin.

Di pirsa vekirina bûroyeke KNKyê da jî, alîyên ku bi vê pirsê ve girêdayî, bi vekirî gotin ku ji ber rewşa tengav ya başûr û muhtemel provakasyonên dewletên cîran yên antî Kurd, ne fermî, belêm bi wê fonksîyonê dikare kar bête kirin. Kes û hêzên ku delegasyonê dîtî, hemûyan jî giringî û hewcehîya yêkitîya neteweyî destnîşan kirin û daxwaza serkevtinê ji KNKyê ra xwastin.

Hevdîtinên KNKyê yên digel KKKyê jî gelek serkevtî borîn û delegasyonê pêşnîyarên xwe bi vekirî û nivîskî pêşkêş kirin. Konseya KKKyê ev dîtin û pêşnîyarên KNKyê gelek maqûl û di cih da dîtin û destek dane KNKyê. KKKyê aşkera got ku ew dê hevkarîya xwe ya digel KNKyê di sewîyeya herî bilind da bidomînin û çi rol û wezîfe bikeve ser mile wan di derbareyê yêkitîya neteweyî da, ew dê bi mesûlîyet bi cih bînin.

Gera delegasyona KNKyê, di vê çarçoveya giştî da baş û serkevtî derbaz bû û xizmeta germkirin û domandina têkilîyên neteweyî kir.

Pêşnîyara me

Piştî vê gera dirêj ya li başûr û encama hevdîtinên piralî, em wekî delegasyon gihiştine wê qenaetê ku, KNK dikare bûroya xwe li goreyî rewş û şertên başûr veke.

Herweha em di wê bawerîyê da ne ku, ji îro pêve em dikarin dest bi amadekarîya komkirina konferansa neteweyî bikin. Ji bo vê yêkê em dikarin komisyonekê hilbijêrin û însîyatîveke xurt bidine dest pê kirin.

Di dawîyê da, em ji dil spasî hemû hêz û kesên ku em dîtî û seradanîya me kirî û mêhvan kirî, dikin.

www.arsivakurd.org

Spaseke taybetî jî bo xebatkarên DIHAyê yên li Kurdistana Federal, Kurdistan TV û ROJ TV û Y. Ö. Politikayê.

Delegasyona KNKyê
Elî Egîd
Tahir Kemalîzade
Rojan Hazim
Adem Uzun

14yê Sibatê 2007

(*) Serokê KNKyê **Elî Egîd**, li ser gora Mustefa Barzanîyê nemir axivt û rêz û vîna delegasyonê ya beramberî têkoşîna wî û hemû têkoşerên Kurdistanê û şehîden nemir yên doza Kurdistanê îna ziman.

Endamê Konseya rêvebir ya KNKyê **Rojan Hazim** jî, li ser navê delegasyona KNKyê ev mesaja li jêr li deftera Şehîdgeha Harûn nivîsî:

Şehîdên doza mezin, şehîdên doza Kurd û Kurdistanê,

We bedelê herî pîroz, cane xwe, fedayî doza neteweyê Kurd û welatê xwe Kurdistanê kir. Neteweyê Kurd, we ji bîr nake, hûn dê her di dilê neteweyê Kurd da jînde bimînin.
Bila silava herî germ, vîna herî tîr û rêza herî mezin ji bo we be!
Hûn bi giyanê xwe yê nemir, hêj jî nobedarên neteweyê xwe, welatê xwe ne.

Delegasyona KNKyê:
Elî Egîd, serokê KNKyê
Tahir Kemalîzade, cihgirê serokê KNKyê
Rojan Hazim, endamê Konseya Rêvebir ya KNKyê
Adem Uzun, endamê Konseya Rêvebir ya KNKyê

25 Çileyê 2007

***

„... Konseya rêvebir ya KNKyê di kombûna xwe ya awarte da gera delegasyona KNKyê ya li Kurdistana Federal bi berfirehî biha kir û gihişte wê biryarê ku seradanî bi serkevtî borîye û spasîya xwe dîyar kir ji bo hemû hêz û kesên ku digel delegasyonê rûniştine, dîtine û mêhvan kirine...“

Daxuyanîya KNKyê ya Sibatê

Konseya rêvebir ya KNKyê 15yê Sibatê kombûna xwe ya awarte kir.

Konseya rêvebir ya KNKyê di kombûna xwe ya awarte da gera delegasyona KNKyê ya li Kurdistana Federal bi berfirehî biha kir û gihişte wê biryarê ku seradanî bi serkevtî borîye û spasîya xwe dîyar kir ji bo hemû hêz û kesên ku digel delegasyonê rûniştine, dîtine û mêhvan kirine.

Konsey di rewşa îro ya gelek nazik da dubare li ser giringî û hewcehîya lezîn ya yêkitîya neteweyî rawesta û biryar da ku hewildanên ji bo komkirina konferansa neteweyî bidomîne.
Konseyê herweha girtina rêberê KKKyê Abdullah Ocalan ya di 15ê Sibata 1999ê da careke dî şermizar kir û bang li xelkê Kurd û cîhana humanîter kir ku piştevanîya xwe ya bi Ocalan ra bidomînin û ji bo azadîya wî xebatên xwe bilindtir bikin.
Konsey li ser operasyonên dewleta Tirk yên li bakura Kurdistanê û fişar û gefên li ser Kurdistana Federal jî bi giringî rawesta û ji xelkê Kurd û pêşengên polîtîk xwast ku dijî êrişkarîya dewleta Tirk bi hev ra têkoşînê bidin.

Konseyê operasyonên li ser Kurdên cografyaya Yêkitîya Ewrûpayê (YE) jî şermizar kir û bang li dewletên YEyê kir ku dawî li vê êrişkarîya xwe bînin û digel berpirsiyarên Kurd di nav têkilîyê da bin û pirsgirêkan bi rêyên demokratîk çareser bikin û polîtîkerên hatine girtin jî berdin.

Di encam da konseya rêvebir ya KNKyê bang li hemû hêz û kesên Kurd û Kurdistanê kir ku destkevtên neteweyî biparêzin, têkilî û dîyaloga navxweyî xurttir û mayînde bikin.

KNK dê li goreyî mîsyonê xwe, kar û xebata bi giştî neteweyî, hem li nav welat, hem jî li derveyî welat û di hemû platformên navneteweyî da dê bi hêztir bike û bidomîne.

Konseya Rêvebir ya KNKyê

15 Sibat 2007, Bruksel

www.arsivakurd.org

Daxuyanîya Konseya Rêvebir ya KNKyê ya Adarê

Konseya Rêvebir ya KNKyê di 4ê Adarê da kombû û ev daxuyanî da:

Bi destpêka demsala biharê pêve ertêşa Tirk dîsa ve hewildanên xwe yên operasyonel zêde û xurt kirin. Ertêş vê carê dixwaze baskê operasyonên xwe ji bakur heta başûr fireh bike. Dewleta Tirk ji bo vê armanca xwe ya antî Kurd û antî Kurdistan, digel Îran û Sûrîyeyê jî bi koordîne hereket dike û ev hersê dewletên dijî Kurd û Kurdistanê, êrişên xwe bi hev ra pêktînin. Rasthatineke normal nîne ku berpirsiyarên dewleta Tirk yên sivîl û leşkerî bi yêk devî diaxivin û armanca ertêşa xwe wisa îlan dikin: ”Ertêş armanca te ya ewil Qendîl û Kerkûk e”!. Ev ferman û biryara dewleta Tirk, bi gotina herî sade ”bi agir leyistine”!. Li goreyî vê konseptê hem fişareke nedîtî li ser Kurdistana Federal dikin, hem jî bi gef û gur û entrîkayên bazareke kirêt dixwazin Amerîkayê jî bikine şirîkê vê êrişkarîya xwe û bi armanca belavkirinê hêzên HPGyê yên li ”Warên Parastinê yên Medyayê” ablûka bikin.

KNK dixwaze bide zanîn ku eve planekî gelek qirêj û tehlîke ye û dê felaketê bi xwe ra bîne ku di serî da dewleta Tirk dê zerara herî mezin jê bibîne. KNK xelkê Kurd li seranserî Kurdistanê û diasporayê û xelkên hevqeder yên Kurdistanê agahdar dike ku li ser van planên dijminane yên dewleta Tirk û tifaqdarên wê, hişyar bin û tifaqa xwe vehûnin û bi xebat û têkoşîneke xurt rê li ber van kiryaran bigirin. KNK herweha bang li cîhana humanîter jî dike ku di vî demê bêhnçikêr da piştevanîya herî mezin nîşanî xelkê Kurd û xelkên kêmanî yên Kurdistanê bidin.

Dewleta Tirk paralelî van operasyonên leşkerî, li derveyî welat jî adeta xwe pêşkêşî dewletên Ewrûpayê dike ku bizava Kurdan li cografyaya Yêkitîya Ewrûpayê jî tengav bike. Mixabin ku ji pratîka antî demokratîk ya hindek dewletên YEyî jî dewleta Tirk îstîfadeya herî mezin dike. KNK hêvî dike ku dewletên YEyê huqûqa xwe û normên xwe yên demokrasîyê binpê nekin û keysî nedine dewleta Tirk.
KNK li ser saxîya rêberê KKKyê Abdullah Ocalan jî alarmê dide û bi giringî dixwaze xelkê Kurd, xelkên hevqeder yên Kurdistanê bi baldarî hişyar bike ku dijî polîtîka mirandinê ya li ser Abdullah Ocalan bêdeng nemînin û reaksîyona xwe di çarçoveya demokratîk da bi xurtî nîşan bidin. Dewleta Tirk, ji roja ku Ocalan dîl girtî were, operasyona mirandinê gelek sîstematîk pêktîne li ser Ocalan. Parêzerên Ocalan, nimûneyên ji pora Ocalan di laboratuwarên bisporan da dane kontrol kirin û di encam da derkete meydanê ku Ocalan roj bi roj tête jahrî dan. KNK dewleta Tirk bi xurtî hiştar dike ku zûtirîn dem vê operasyona mirandinê ya li ser Ocalan bi dawî bîne û rojek zûtir rê bide bisporên serbixwe yên navneteweyî ku Ocalan muayene bikin. Dewleta Tirk divêt baş bizane ku fatûraya operasyona li ser Ocalan dê li ser wan gelek giran raweste!.
KNK bang li xelkê Kurd û xelkên hevqeder yên Kurdistanê jî dike ku bi hazirîyeke mezin, Newroza îsal ji salên borî geştir pîroz bikin. Newroza îsal divêt bibe cejna herî mezin ya îrade û berxwedana xelkê Kurd beramberî dijminên li çaralî.

Konseya Rêvebir ya KNKyê herweha biryar da ku li 12-13yê Gulanê [*] kombûna giştî ya KNKyê pêkbîne ku bi biryar û xebata hevrayî ya hemû endaman xwe hazirî xebateke xurttir û bihêztir bike. Konseya Rêvebir dubare destnîşan kir ku ”14yê Gulanê, Roja Cejna Zimanê Kurdî”, bi şahîyeke mezin û hevrayî ya digel hemû hêzên neteweyî dê bête pîroz kirin. Di 16-17yê Hezîranê da jî ”Konferansa Jinên Kurdistanê” dê bête kirin.

Konseya Rêvebir ya KNKyê
4 Adar 2007, Bruksel

[*] Demê kombûnê hate paşxistin bo 23 – 24ê Hezîranê - 2007.

***

„... KNK dewleta Tirk bi xurtî hiştar dike ku zûtirîn dem vê operasyona mirandinê ya li ser Ocalan bi dawî bîne û rojek zûtir rê bide bisporên serbixwe yên navneteweyî ku Ocalan muayene bikin...“

www.arsivakurd.org

Konseya rêvebir ya KNKyê li ser rewşa rêberê KKK-PKKyê Abdullah Öcalan, nameyek ji berpirsiyar û mezinên YE û UNê ra şand. Name li jêr e.

5 Adar 2007, Bruksel

Bo birêz

Li goreyî agahdarîyên parêzerên serokê KKK-PKKyê Abdullah Ocalan yên di preskonferansa 1î Adarê li Romayê da, dewleta Tirkîyeyê gelek sîstematîk Abdullah Ocalan bi elementên kîmyayî û radyoaktîv jahrî dide. Parêzerên Ocalan ev agahîye piştî ceribandina bisporan ya li ser pora Ocalan ya di laboratuwaran da kivş kir. Ev bûyere bi serê xwe encameke gelek bi dehşet e. Ji vê muayeneya bisporan ya li ser pora Ocalan kivş dibe ku dewleta Tirk di girtîxaneya Imralî da, gelek bi zanahî û di prosesa demekî dirêj da dixwaze Ocalan jahrî bide û bi vî rengî dawî li jîyana Ocalan bîne. Bi vê encama laboratuwarî xuya dibe ku Abdullah Ocalan li ber mirandinê ye. Ev reftara dewleta Tirk bi çu awayî ne dikare bête îzah kirin, nejî qebûl kirin û eve aşkera kuştina Ocalan ya bi îşkence ye.

Xelkê Kurd li seranserê Kurdistanê û dîasporayê gelek heq nerazîbûna xwe dîyar dike û vê muameleya dewleta Tirk ya cinayetane ya li ser Ocalan, protesto dike.

KNK jî wekî organîzasyoneke sihwaneyî ya Kurdistanê, bi navê xelkê Kurd di derheqê jîyana Abdullah Ocalan da, di nav endîşeyeke mezin da ye. Lewma KNK hêvî dike ku hûn jî vê hissîyata xelke Kurd têbigihin û endîşeya xelkê Kurd parve bikin.

KNK herweha tikayê ji we dike ku tesîra xwe li ser dewleta Tirk bi kar bînin û Tirkîyeyê hişyar bikin ku vê reftara xwe ya kuştdarîyê ya li ser Ocalan bi dawî bîne.

Di encam da, em wekî KNK teklîf dikin ku hûn Ocalan bi heyeteke doktorên bispor yên navneteweyî bidine muayene kirin û jîyana wî hem di çarçoveya mafên mirovî, hem jî di çarçoveya mafên girtîyên polîtîk da hilgirin bin ewlehîyê.

Jîyana Abdullah Ocalan di girtîxaneya Imralî da li Tirkîyeyê, di nav tehlîkeyê da ye û KNK li ser Ocalan alarma jîyanî dide.

Em ji niha ve spasdarê hevkarî û piştevanîya we ne û herweha bawer dikin ku hûn me bêbersiv nahêlin.

Digel rêz û silavên me.

Bi navê Konseya Rêvebir ya KNKyê

Alî Yigit [Elî Egîd]
Serokê KNKyê

***

Hawara Helepçeyê

Konseya rêvebir ya KNKyê, di salvegera 19. ya jenosîda Helepçeyê da daxuyanîyek da. Di daxuyanîyê da hate destnîşan kirin ku xelkê Kurd şêhîdên Helepçeyê çu cara ji bîr nake û dê her wextî bi bîrînana şehîdên Helebçeyê û hemû şehîdên Kurdistanê ve girêdayî be.

Delegasyona KNKyê jî di gera xwe ya Kurdistana Federal da seradanîya Helepçeyê jî kiribû.

Li ser vê seradanîyê ROJAN HAZIM bi kurtî wisa digot:
”Helepçe bi her awayî di nav perîşanîyeke mezin da bû. Me di 19. salvegera jenosîda Helepçeyê da ev hizir nedikir ku em dê rastî Helepçeyeke wêran bên. Em bi dîtina Helepçeya kavil û weran, bêserûber û perîşan bi rastî şoke bûn. Helepçe bi vê sefaleta ku têda dijî, dike HAWAR!.
Me ev dîtîyên xwe, hissîyata xwe ji bo rêvebirên Kurdistana Federal jî gotin û tika ji wan kir ku li Helepçeyê xwudan derkevin, dawîyê li vê perîşanîya Helepçeyê û xelkê Helepçeyê bînin. Em hêvî dikin ku rêvebir û berpirsiyarên Kurdistana Federal dê biçine hawara Helepçeyê û li Helepçeyê xwudan derkevin!.”

www.arsivakurd.org

Li jêr nivîsara ROJAN HAZIM ya li ser Helepçeyê diweşînin. (*)

Gelo Helepçe hate ji bîr kirin?

ROJAN HAZIM

Piştî jenosîda 16-17yê Adara 1988ê li ser xelkê Kurd li Helepçeyê, meha Adarê digel Newrozê bûye meha jenosîda Helepçeyê jî. Ji sala ew bûyera dilsoj pêkhatî were, xelkê Kurd Helepçe ji bîr nekir, bi her reng û metodî nerazîbûna xwe, xem, kul û kesera xwe îfade kir, dengê xwe bilind kir, kirdarên bûyerê rûreş û şermizar kirin. Cîhana humanîter jî bû şirîkê xem û protestoya xelkê Kurd.

Li başûra Kurdistanê ji 1992ê pêve, ewil di nav tixûbên paralela 36an da, piştî hilweşandina rejima Seddam ya 2003an jî di nav Iraqa nû ya Federal da, desthilata xweser ya xelkê Kurd pêkhat, xelkê Kurd jîyana xwe di nav vê rewşa nû ya azad da ji nû ve organîze kir. Ji wan salan pêve êdî bajêrkê Helepçeyê bi xwe bû sentera bîrînana jenosîda Helepçeyê. Bi hevkarîya cîhana humanîter jî rêvebirîya Kurdistanê monumentek û şehîdgehek ava kirin ku hersal seramonî lê bêne kirin û bibine sembola jibîrnekirina jenosîda Helepçeyê. Helbet ev hewildane karekî hewce bû ku ev sembol daîm li ber çav bin ku gorîyên Helepçeyê neêne ji bîr kirin.

Lê belê tiştek hate ji bîr kirin; dilê xwecihên Helepçeyê, dilê xelkê Helepçeyê, yê ku her malekê bi kêmasî şehîdek dayî di wê jenosîdê da, dilê wan yê birîndar nehate kirîn. Helepçe ji nû ve nehate ava kirin, bo sefalet, hejarî, rebenî û perîşanîya xelkê Helepçeyê karên konkret ku jîyana wan xweş bikin, nehatin kirin. Xelkê Helepçeyê bi sebireke kûr û mezin hersal guhdarîya axivtinên seramonîyal kir. Wan axivtinan belkî dilê wan piçekê hûnik dikir, belêm zikê wan yê birsî têr nedikir. Rêvebirên polîtîk û îdarî yên Kurdistana Federal, mixabin, sozên xweşkirina jîyana xelkê Helepçeyê, biryarên ji nû ve avakirina Helepçeyê her sal bo saleke dî paşdan. Tixûbê sebira xelkê Helepçeyê ji teref hukûmetê ve hate bezand û xelkê Helepçeyê êdî peqî û nerazîbûna xwe di bîrînana Adara 2006an da bi rengekî protestoyî da der.

Heke hiş û bîr bêne taze kirin, xelkê Helepçeyê di Adara 2006an da bi mîtîngeke boş nerazîbûna xwe nîşan da, reftara xemsar ya rêvebirîya Kurdistanê ya beramberî Helepçeyê, protesto kir. Di wê protestoya demokratîk da, mixabin ku îdareya navçeyê metodekî antî demokratîk bi kar îna û bi şiddeta polîsî mîtînga xelkê Helepçeyê belav kir û di encam da ciwanekî 19 salî yê bi navê Ehmed Silêman bi sîleha polîsan hate kuştin û çend kesek jî hatin birîndar kirin. Di wê atmosfera bi şiddet da, ji nav protestêran "çendekan" monumentê ku ji bo bîrînana jenosîda Helepçeyê hatîye çêkirin, sotin. Helbet di wê protestoya demokratîk da sotina monumentî karekî şaş û hetta provakatîv bû, lê belê, ev şaşîya ji teref "çendek protestêran" ve hatîye kirin, nabe mazereta şiddeta polîsan û wê muameleya antî demokratîk!.

Evsal ji ser jenosîdê 19, ji ser bûyera sotina monumentî jî salek derbaz bûye, belêm Helepçe hêj jî nehatîye ava kirin, jîyana xelkê Helepçeyê nehatîye xweş kirin û di ser da jî ew monumentê hatîye sotin jî nehatîye nûve kirin. Helepçe di salvegera jenosîda 1988ê da, di nozdemîn sala xwe da, hêj jî kavil û wêran e. Helepçe îro di nav deryaya qurê da adeta melevanîya dike!. Bê kar û gendanî, neçarî û feqîrîya li Helepçe û dorberê tête jîyan, ji jenosîda 1988ê dilsojtir e îro. Ev rewşa wêran ya Helepçeyê ya îro, bi gotina herî nerm, ji alîyê ehlaqî ve rûreşî û şermizarî ye, ji alîyê berpirsiyarîya sosyal û polîtîk ve jî qusûr û ihmaleke mezin ya desthilata Kurdistana Federal e!. Çawa wijdana berpirsiyarên hukûmeta Kurdistana Federal, ya rêvebirên polîtîk û îdarî yên navçeyê jan nade li ber vê belengazî û perîşanîya xelkê Helepçeyê!. Ew monumentê hatîye sotin di midehê salekê da çawa naête nûve kirin!. Xelkê Kurd kul û kesera xelkê Helepçeyê ji bîr nekirîye, belêm mixabin ku hukûmeta Kurdistana Federal heçku Helepçe ji bîr kirîye!.

Xelkê Helepçeyê bi van kiryarên antî demokratîk tête bêsiyanet kirin, xurûra xelkê Helepçeyê tête şkandin. Xelkê Helepçeyê ev reftar heq nekirîye!. Gelo rêvebirên Kurdistana Federal yên her xelekê, wekî diçin Helepçeyê û li pêşberî xelkê Helepçeyê diaxivin, rûyê wan sor dibe?. Gelo hukûmeta Kurdistana Federal, li hêvîya çi ye?. Dixwazin dîsa ve provakasyon bêne kirin li nav Helepçeyê?. Wijdana Kurdbûyînê danin alîyekê, wijdana mirovahîyê tehemmulî van xemsarîyên li Helepçeyê têne kirin nake!.

Zikê xelkê Helepçeyê ji axivtinên ajîtatîv, ji soz û biryarên ku di seramonîyan da têne dan, gelekî têr e!.

www.arsivakurd.org

Xelkê Helepçeyê, Helepçe, li hêvîya kar e, li hêvîya xweşkirin û rehetkirina jîyanê ye, li hêvîya ji nû ve avakirina bajêr û gundên dorberê ye.
Hukûmeta Kurdistana Federal, rêvebirên polîtîk û îdarî yên navçeyê, rojek zûtir dest bi kar bin!. Di salvegera 20. ya jenosîdê da, di Adara 2008ê da, tevayî xelkê Kurd, Helepçeyeke avadan, monumentê nûvekirî, bajêrekî xweş, xelkekî dilşa, têr, rûken û razî dixwaze bibîne!.

(*): Ev nivîsar, di Yeni Özgür Politikaya 14yê Adara 2007ê da hatîye weşandin.

***

Newroza 2007ê

KNKyê Newroza xelkê Kurd, ya xelkên Kurdistanê pîroz kir.
KNKyê bi munasebeta pîrozîya Newrozê di merkeza xwe ya li Brukselê da, resepsîyonek da. Gelek mêhvanên bîyanî û kesayetîyên polîtîk û ronakbîr û hunermendên Kurd beşdarî vê pîrozbahîyê bûn. Hunermend Beser, Şemdîn, Dilovan û Seyitxan, zîyafeteke muzîkê pêşkêşî mêhvana kirin. Serokê KNKyê Elî Egîd di axivtina vekirina resepsîyonê da Newroza beşdaran, ya tevayî xelkê Kurd, ya xelkên kêmanî yên Kurdistanê pîroz kir, daxwaz û biryardarîya serkevtina xelkê Kurd û Kurdistanê teyîd kir û êrişkarîya rejimên dagîrker jî şermizar kir.
Konseya rêvebir ya KNKyê di kombûna xwe ya di serê meha Adarê da, bang li xelkê Kurd kiribû ku bi boşhîyeke gelek mezin beşdarî pîrozbahîyên Newrozê bibin û li hemû bihayên xwe yên neteweyî xwudan derkevin û xwezî û daxwaza xwe ya azadîyê bi dengekî gur bilind bikin.

Di daxuyanîya Konseya Rêvebir ya KNKyê da wisa hatibû gotin:
"KNK bang li xelkê Kurd û xelkên hevqeder yên Kurdistanê jî dike ku bi hazirîyeke mezin, Newroza îsal ji salên borî geştir pîroz bikin. Newroza îsal divêt bibe cejna herî mezin ya îrade û berxwedana xelkê Kurd beramberî dijminên li çaralî…"
Xelkê Kurd li seranserê welat û li hemû meydanên dîasporayê bersiva vê banga KNKyê bi germî da û timamî cografyaya Kurdistanê û salon û kolan û meydanên her welatê ku lê dijîn mişt tijî kirin û bi cil û berg û rengên neteweyî Newroza xwe pîroz kir.
Xelkê Kurd Newroza îsal jî bi giyanekî têkoşerî pîroz kir. Xelkê Kurd û xelkên kêmanî yên Kurdistanê, mil bi milê hev daxwaza xwe ya azadîyê bilind kirin. Newroz li Kurdistana Federal jî bi rengekî gelerî û bi coş û heyecaneke mezin hate pîroz kirin û piştevanîya xelkê me yê li parçeyên dagîr û bindest hate kirin.
Di Newroza îsal da, ji Amedê heta Wan, Hekarî, Qers, Urfa, Şirnex, Batman û li hemû bajêr û bajêrkan, navçek û gundan bi milyonan kombûn, bi cil û bergên xwe yên neteweyî hem Newroza xwe pîroz kirin, hem li bihayên xwe yên neteweyî xwudan derketin, hem jî biryardarîya xwe ya bi têkoşîna azadîyê ve nîşan dan. Xelkê me herweha di van meydanên Kurdistanê û dîasporayê da jehrdayîna rêberê KKK-PKKyê Abdullah Ocalan jî bi xurtî protesto kir, lê xwudan derket. Xelkê Kurd, li parçeyên rojhilat û başûrarojava jî, li Mehabad, Sine û bajêrên dî yên rojhilatê, li Qamişlo, Efrîn û bajêrên dî yên başûrarojavayê, bi sedhizaran kombûn û Newroz pîroz kirin, zulm û zora dewletên dagîrker protesto kirin. Xelkê Kurd di Newroza îsal da, daxwaza xwe ya yêkitîya neteweyî jî bi dengekî bilind got. Newroza 2007ê li seranserî Kurdistanê û li meydanên dîasporayê bu platforma azadîxwazîya xelkê Kurd û hemû xelkên Kurdistanê.

Newroza 2007ê, yêkitîya xelkê Kurd, biryardarîya xelkê Kurd, têkoşerîya xelkê Kurd, xwudanderketina xelkê Kurd ya li bihayên neteweyî, nîşanî yar û neyaran da. Tête hêvî kirin ku ev mesaja gur û geş ya xelkê Kurd ya di pîrozbahîya Newrozê da hatîye dan, di wijdana yar û neyarên xelkê Kurd da deng vede û bibe binasê çareserîyeke maqûl û dadyar di pirsa bi giştî xelkê Kurd û Kurdistanê da.

RH

***

Adar, meha Newrozê

1ê Adarê: Bi presskonferansa Romayê, awûkatên rêberê KKK-PKKyê Abdullah Ocalan, jehrdayîna dewleta Tirk ya Ocalan aşkera kirin. Ji wê rojê pêve Kurd rabûn ser pêya û ev kiryara dewleta Tirk protesto kirin û li Ocalan xwudan derketin.
8ê Adarê: Roja jinên kedkar yên cîhanê hate pîroz kirin û zulm û zora li ser jinê hate şermizar û protesto kirin.

www.arsivakurd.org

12yê Adarê: Şehîdên serhildana Qamişlo û bajêrên dî yên başûrarojavaya Kurdistanê, hatin bîrînan û êrişkarîya rejima Sûrîyeyê hate şermizar û protesto kirin.
16-17yê Adarê: 19. salvegera jenosîda Helepçeyê hate bîrînan û careke dî rejima Seddamê gor bi gor û Beasa faşîst hate protesto kirin.
21ê Adarê: Cejna Newrozê bi giyanekî têkoşerî û berxwedanî û bi beşdarîya milyonan xelk, hate pîroz kirin.

***

Banga Konseya Rêvebir ya KNKyê li ser 14yê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî

Hemû xelk û neteweyên cîhanê, di rojeke salê da, cejna zimanê xwe pîroz dikin. Heta nihe tradisyoneke bi vî rengî di nav xelkê Kurd da nehatibû dest pê kirin. Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, KNKyê, di sala 2006ê da, bi pêşniyara komisyona ziman û perwerdeyê ya KNKyê, 14yê Gulanê wekî roja "Cejna Zimanê Kurdî" qebûl kir û dîyarî xelkê Kurd kir. KNK hêvî dike ku xelkê Kurd dê li roja cejna zimanê xwe xwudan derkeve û hersal vê cejna zimanê xwe pîroz bike û vê cejnê mayînde bike û wekî tradisyon bidomîne. Zulm û zora li ser xelkê Kurd di serî da bi qedexekirina zimanê Kurdî dihate kirin û îro jî têtе domandin. Asîmîlasyona li ser zimanê Kurdî hatîye kirin, li çu zimanan nehatîye kirin. Belêm xelkê Kurd bi rikeke nedîtî, li zimanê xwe xwudan derket, zimanê xwe jînde kir. Bi jînde mana zimanê Kurdî xelkê Kurd jî jînde ma. Xelkê Kurd bi parastina zimanê xwe, xwe jî parast, paşeroja xwe ronahî kir.

KNK hazirîya pîrozkirina "Cejna Zimanê Kurdî" dike. KNK starta pîrozbahîyên "Cejna Zimanê Kurdî" bi programa "Rojbaş Kurdistan" ya ROJ TVyê, di spêdehîya 14yê Gulanê da, dide. KNK êvarîya roja 14yê Gulanê jî, "Cejna Zimanê Kurdî" di merkeza xwe ya li Brukselê da bi resepsîyonekê pîroz dike.

KNK bang li xelkê Kurd û timamî rêxistinên Kurdistanê dike ku li seranserê Kurdistanê û li hemû cih û warên dîasporayê, 14yê Gulanê, "Cejna Zimanê Kurdî" her bi çi rengî be pîroz bikin.
Zimanê Kurdî hebûna xelkê Kurd e.
Zimanê Kurdî paşeroja xelkê Kurd e.
14yê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî li xelkê Kurd û hemû xelkên Kurdistanê pîroz be.

4 Adar 2007

***

"... Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, KNKyê, di sala 2006ê da, bi pêşniyara komisyona ziman û perwerdeyê ya KNKyê, 14yê Gulanê wekî roja "Cejna Zimanê Kurdî" qebûl kir û dîyarî xelkê Kurd kir. KNK hêvî dike ku xelkê Kurd dê li roja cejna zimanê xwe xwudan derkeve û hersal vê cejna zimanê xwe pîroz bike û vê cejnê mayînde bike û wekî tradisyon bidomîne..."

www.arsivakurd.org

Nivîsara Ehmed Dere ya li ser Parlementa Ewrûpayê li jêr didin.

Parlementa Ewrûpayê

EHMED DERE

Di nava sazîyên Yekitîya Ewrûpayê de sazîya ku nûner û endamên wê dîrekt ji alîyê gel ve tê hilbijartin Parlement e. Ji sala 1962an vir ve, di nava YEyê de ev Parlement rolekî sereke dileyize. Destpêkê de navê wê ”Parlementa Neteweyan” bû, endamên wê jî ji alîyê Parlementên neteweyî ve dahatin diyar kirin. Lê belê, bi guherînên ku di sîyaseta YEyê de pêkhatin, navê wê Parlementê guherî û bû ”Parlementa Ewrûpayê” [PE]. Ji sala 1979an vir ve, endamên wê dîrekt ji alîyê gel ve têne hilbijartin. Roja îro ev Parlement ji 785 endaman pêk tê. Di PEyê de 7 grûbên sîyasî hene. Her Parlementter gor nêzîkatîyên sîyasî û îdeolojîk yên partîyên xwe di nava grûban de cih digirin. Grûba herî mezin ya ”Xiristîyan Demokrat”an e, piştre jî ya sosyalîstan, lîberalan, keskan, çepan, ”Yekitîya ji bo Ewrûpa Neteweyan” û ”Demokratên Serbixwe” ne. Bi tevlêbûna Romanya û Bulgaristanê ve, çav li rê ye ku grûbeke ”neteweperêsan” jî çêbibe. Bi awayekî asayî her sê salan carekê serokê Parlementê ji nû ve tê hilbijartin. Lê belê, di dîroka vê Parlementê de pir caran di nava du salan de jî hilbijartin pêkhatine. Du roj berê dîsa hilbijartin pêkhatin. Ji sala 2004an vir ve endamê grûba sosyalîst birêz Josep Borrell Fontelles, yê bi eslê xwe Îspanî ye, ji vê Parlementê re serokatî dikir. Ji niha heya sala 2010an dê endamê grûba Xiristîyan Demokratan birêz Hans-Gert Poettering, yê ku bi eslê xwe Alman e, ji vê sazîyê re serokatîyê bike. Piştî hilbijartinên yekemîn yên vê Parlementê, ango ji sala 1979an vir ve, serokatîya vê sazîyê di navbera grûbên mezin de tê parve kirin. Bi taybetî ji salên 1990î vir ve ev berpirsyartî tim di destê grûbên Xiristîyan Demokrat û Sosyalîstan de ye. Tenê carekê ev berpirsyartî ji grûba sêyemîn, ya Lîberalan re hatîye dayîn. Grûbên dî zêde nikarîne bibin xwedîyê vê berpirsyartîyê. Çawa ku di sîyaseta gişti ya YEyê de Xiristîyan Demokrat xwedîyê soza herî giran in, di PEyê de jî ew vê giranîya xwe diparêzin. Lewma, di pêşketinên sîyasî yên li Ewrûpayê de nêrîna ku hakim e ya Xiristîyan Demokratan e. Bi hilbijartina Hans-Gert Poettering ve girêdayî ev giranî dê di PEyê de zêdetir xwe bide xuyan. Tê zanîn ku pozisyona Xiristîyan Demokratan zêde ji bo endametîya Tirkîyeyê, ya ji bo YEyê baş nîne. Bi taybetî partîya Hans-Gert Poettering, ku seroka wê Angela Merkel e, xwedîyê nêzîkatîyeke dijberê endametîya Tirkîyeyê ye. Ev nêzîkatî ji alîyê partîyên dî yên Xiristîyan Demokratên ewrûpî ve jî tê parastin. Ji vir şûnde dê di navbera Tirkîyê û PEyê de zehmetîyên ji bo pêşxistina dîyalogan zêdetir bibin. Derbareyê pirsgrêka Kurd de, ez bawer nakim ku zêde guhertin çêbibin. Rola ku PEyê heya niha leyistîye dê bi awayekî asayî bidome. Heke dengê pêşketinên ku li Kurdistanê û li Tirkiyeyê çêdibin di vê Parlementê de baş werin belav kirin, dê nêzîkatîya PEyê jî biguherîne. Her tişt bi tekoşîna me û xebatên me ve girêdayîye.

Not: Ev nivîsar, 18 Çile 2007ê, di ”Yeni Özgür Politika”yê da hatîye weşandin.

***

„... Ji vir şûnde dê di navbera Tirkîyê û PEyê de zehmetîyên ji bo pêşxistina dîyalogan zêdetir bibin. Derbareyê pirsgrêka Kurd de, ez bawer nakim ku zêde guhertin çêbibin. Rola ku PEyê heya niha leyistîye dê bi awayekî asayî bidome. Heke dengê pêşketinên ku li Kurdistanê û li Tirkiyeyê çêdibin di vê Parlementê de baş werin belav kirin, dê nêzîkatîya PEyê jî biguherîne. Her tişt bi tekoşîna me û xebatên me ve girêdayîye...“

www.arsivakurd.org

Çend wêne ji sefera delegasyona KNKyê li Kurdistana Federal

Adem Uzun, Elî Egîd, Tahir Kemalîzade, Rojan Hazim
Gora Mustefa Barzanî – Barzan – Sibat 2007

Serokê KNKyê Elî Egîd,
li ser gora
Mustefa Barzanîyê nemir
axivt û rêz û vîna delegasyonê ya beramberî têkoşîna wî û hemû têkoşerên Kurdistanê û şehîden nemir yên doza Kurdistanê
îna ziman.

www.arsivakurd.org

Tahir Kemalîzade, Adem uzun, Xalê Hesen, Rojan Hazim, Elî Egîd
Şehîdgeha Harûn – Çile 2007

Endamê Konseya rêvebir ya KNKyê Rojan Hazim, li ser navê delegasyona KNKyê ev mesaja li jêr li deftera Şehîdgeha Harûn nivîsî:

Şehîdên doza mezin, şehîdên doza Kurd û Kurdistanê,
We bedelê herî pîroz, cane xwe, fedayî doza neteweyê Kurd û welatê xwe Kurdistanê kir. Neteweyê Kurd, we ji bîr nake, hûn dê her di dilê neteweyê Kurd da jînde bimînin.
Bila silava herî germ, vîna herî tîr û rêza herî mezin ji bo we be!
Hûn bi giyanê xwe yê nemir, hêj jî nobedarên neteweyê xwe, welatê xwe ne.
25ê Çileyê 2007

www.arsivakurd.org

Adem Uzun, Feqîrê Lalişê, Elî Egîd, Babê Çawiş, Rojan Hazim, Bahoz Geylanî
Laliş – Sibat 2007

"... Bi bûyerên li navçeya Êzidîyan, li Şêxana Kurdistana Federal qewimî, li 14 heta 16yê Sibatê, careke dî kivş bû ku "xweşbînî" di nav civata Kurd da di dereceya herî kêm da ye. [Şêxan çarêkek dûrî qibleya Êzidîya, perêsgeha Heca wan, Lalişê ye.]... Ev bûyera Şêxan, ji bilî kevneperêsî û xweşnebînîya îslamî ya beramberî Êzidîtîyê, divêt ji alîyê serdestîya zihnîyeta mêrşahî û edetên kirêt û kevnare yên di nav civatê da jî bête riberiz û biha kirin..."

[Ji nivîsara ROJAN HAZIM, Y. Özgür Politika, 01 Adar 2007]

www.arsivakurda.org

Kemal Xeyrî, Tahir Kemalîzade, Elî Egîd, Wezîrê Kulturê Felakedîn Kakeyî, Rojan Hazim, Adem Uzun, Musteşarê Wezareta Kulturê Şakir Rojbeyanî
Wezareta Kulturê, Hewlêr - Sibat 2007

"... Delegasyona KNKyê
di midehê sê heftîyan da,
[Ji 23yê Çileyê heta 12yê Sibatê],
ji organîzasyonên sosyopolîtîk,
sosyokulturel, kesayetîyên serbixwe
yên polîtîk û ronakbîr, nivîskar, hunermend
heta serokatîya
parlementê, parlementer, wezaret û wezîran
û xelkê sade, hevdîtinên berfireh û berwer
pêkînan..."

www.arsivakurd.org

Tahir Kemalîzade, Serokê PÇDK Dr. Faîk Gulpî, Rojan Hazim, Kemal Xeyrî, Elî Egîd, Adem Uzun – Şehîdgeha Helepçeyê - Helepçe - Sibat 2007

"... Evsal ji ser jenosîdê 19, ji ser bûyera sotina monumentî jî salek derbaz bûye, belêm Helepçe hêj jî nehatîye ava kirin, jîyana xelkê Helepçeyê nehatîye xweş kirin û di ser da jî ew monumentê hatîye sotin jî nehatîye nûve kirin. Helepçe di salvegera jenosîda 1988ê da, di nozdemîn sala xwe da, hêj jî kavil û wêran e. Helepçe îro di nav deryaya qurê da adeta melevanîya dike!. Bê kar û gendanî, neçarî û feqîrîya li Helepçe û dorberê têtе jîyan, ji jenosîda 1988ê dilsojtir e îro..."

Ji nivîsara ROJAN HAZIM, "Gelo Helepçe hate ji bîr kirin?" Y. Özgür Politika, 14 Adar 2007

www.arsivakurd.org

Bo organîzasyonên sosyopolîtîk, sosyokulturel, sosyoekonomîk, medyaya Kurdî, ronakbîr, nivîskar, rojnamevan, hunermend, rêvebirên polîtîk û îdarî yên Kurdistanê û timamî xelkê Kurd,

Ji nav elementên ku neteweyan pêktînin, ziman yê sereke ye. Ziman îdentîtêta neteweyan e. Ziman alaya dengî ya neteweyan e. Zimanê me, zimanê Kurdî jî, nîşana hebûna xelkê Kurd e. Zimanê me, zimanê Kurdî, îdentîtêta xelkê me ye. Zimanê me, zimanê Kurdî, alaya dengî ya neteweyê me ye. Zimanê me, zimanê Kurdî, bi salan ji teref dewletên kolonyalîst û dagîrker ve hate qedexe kirin, asîmîlasyoneke nedîtî li ser zimanê Kurdî hate bi kar înan û ev polîtîka asîmîlasyonê bi rengên cuda îro jî tête domandin. Belêm xelkê me, wekî hemû xelkên cîhanê, bi rik, berxwedan û têkoşîneke xurt, ev hebûna xwe ya pîroz parast. Îro xelkên cîhanê salê rojekê cejna zimanên xwe pîroz dikin. KNKyê jî bi vê bîr û bawerî û bihazanîna berxwedana pîroz ya zimanê Kurdî ya dijî asîmîlasyonê, roja 14yê Gulanê wekî roja "Cejna Zimanê Kurdî" qebûl û îlan kir. KNK hêvî û bawer dike ku xelkê Kurd dê vê rojê bi hizir û bîreke bilind ya neteweyî pîroz bike û wekî tradisyon bidomîne.

KNK bang dike ku "14yê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî", li Kurdistanê, li her derê ku Kurd lê, bi şahî, bi semîner, konferans, sempozyûm û axir her bi çi rengî be, bête pîroz kirin.

Parastina Kurdî, parastina Kurdetîyê ye.

KNK ji nihe ve 14yê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî pîroz dike.

ELÎ EGÎD
Serokê KNKyê

ROJAN HAZIM
Serokê Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê

www.arsivakurd.org

14yê Gulanê

Cejna Zimanê Kurdî

Pîroz be

www.arsivakurd.org

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê

KNK

Ji edîtorîyê

KNK Bulten, hejmara duyê di destê we da ye. Di vê hejmarê da jî me cih da daxuyanîyên konseya rêvebir ya KNKyê û herweha kar û xebatên komisyona ziman û perwerdeyê. Delegasyona KNKyê, ku ji serok û endamên konseya rêvebir pêkhatibû, gerek li Kurdistana Federal kir û gelek hevdîtinên piralî pêkînan. Delegasyonê gera xwe bi detay nivîsîbû, belêm li ser daxwaza wan, armanc û encama vê gerê, digel çend wêneyan, bêyî dayîna hindek navên kes û hêzên başûrî yên hatine dîtin, di Bultenê da ye. Bûyer û xebat û aktîvîteyên li meha Newrozê, meha Adarê pêkhatî jî, di Bultenê da cih digirin. Heta hejmara sêyemîn bimînin di nav xêr û xweşîyê da.

Ji KNKyê agahdarî:

* 14yê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî, bi resepsîyona li merkeza KNKyê li Brukselê, dê bête pîroz kirin.
* 16 – 17yê Hezîranê Konferansa Jinên Kurdistanê kom dibe.
* 23 – 24ê Hezîranê, kombûna fireh ya KNKyê bi beşdarîya hemû endaman pêktêt.

www.arsivakurd.org

Adres:
Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK]
Rue Jean Stas 41 / 1060 Bruxelles, Belguque
Tlf.: 0032 2 647 30 84 / Fax.: 0032 2 647 68 49
www.kongrakurdistan.net/com/org